

Qaideyên lêjiyanê li kempên penaberan

1. Aramî û nizam

- Her kesekî li kempên bijî yan li wan bimîne, liser wî ferze ku qaideyên jiyane li kempê bi cî binê.
- Rihetiya cîranên xwe têk nede dema tu guh bidî radyoyê, li televizyonê temaşe bikî, guh bidî cihazê mûsîqê û alavên mîna wan.
- Ji se'et 23.00 an heta se'et 6.00 an gereke kemp aram û bêdeng be.
- Bikaranîna alkoholê yan madeyên din ên serxweşker di rûberên (mesahetên) hevbehr de qedexe ye.
- Kemp wê hemû cirman ragihîne polîs û wê raporê liser wan ji nivîsgeha herêrmî ya Birêveberiya biyaniyan (UDI) re bişîne.
- Lazime tu her gav pêşwext ji kempê bipirs ka tu dikarî mêvanên razanê vehewîni yan na. Dema mêvanên te hebin, lazim e tu wan têbighîni ku lazim e ew miqateyê xelkên din bin.
- Birêveberiya biyaniyan (UDI) dikare nehêle danîştvan mêvanên razanê vehewînin, eger ev tişt ewlehiya kesên din li kempê têxe metirsiyê.

2. Bikaranîna ode û hacetan

- Li daneheva odeyên muşterek miqate be. Bisklêt, erebeyên zarokan û hacetên din ji rêya hatûçûna rûniştîyên din bide alî.
- Paqijkirin û daneheva oda te mesûliyeta te ye.
- Lazim e tu gemar, zibil û gelêşê bavêjî sindoqên gemarê .

- Lazim e n muşterek yê hunderîn bi intizam bêne şuştin. Lîsteyek hatiye çêkirin ku dide xuyakirin kengî dora te ya şuştinê/paqijkirinê ye, lazim e tu ji demê heta bi demê lê lîsteyê temaşe bikî.
- Rûniştîyên kempê hemû beşdariyê di te'mîrkirina (siyaneta) hunderîn û ya derveyî de dikin. Lîste hene ku didine xuyakirin kengî dora her yekî ji rûniştîyên kempê ye.
- Fêr bibe ka tê çawa makîna şuştina kincan, makîna ziwakirina kincan û hacetên din ên hevbehr (muşterek) bikarbînî. Li lîsteya dora şuştina kincan yan ya bikaranîna hacetên din binêre.
- Cixarekêşan di odeyên hevbehr de qedexe ye.

Qaideyên lêjiyanê di wan avahiyên de ku mercê (şertê) nekêşana cixaran di kontrakta kirêkirina xanî de heye:

- Cixarekêşan di oda te de qedexe ye eger xudanê xanî biryar bi vî tiştî dabe.

3. Barkirin

- Oda xwe/apartmana (şuqqe) xwe bide hev û bişo berî barkirinê ji kempê.
- Berî tu herî kilîtan teslîm bike. Liser te ferze ku tu bihayê kilîtan ku te winda kirine bidî. Eger te re'bûna kilîtan dabe, wê pereyê re'bûnê li te bêne vegerandin dema tu kilîtan teslîm bikî.